WÊNEYEK JI SERHILDANA QAMIŞLO

Gulnar Elî

Li asîmanê dîroka reş
Ewrên tarî dilîzin
Baran zuha ye
Birînên xilmaşiyê kewandin
Kevî li ser lavêja sirudên pîr û kalan
Zinaran dozê li ser destên xwe gindirandin
Stirandin
Nêçîr rêya kadiza berneda
Nêçirvan, xwîsiya şuneşora di çavên
Stûnên konên qijilî de vedidin
Axînên bêgunehan dilîlînin
Xemên vepeçiyayî ji zikmakî ve
Şekira xwînê ne
Ava me xwîne
Navê me xwîne
Stiranên me xwîne
Zimanê ber destê xwînê ye
Navê me bûye xwîn
Welat bûye xwîn

Xew di nav xilmaşiya xwînê de xwîne
Xwîn xwîne, û hiviyarî jî xwîne
Birînên me bişkivîn li qamişlo
Gul bi rengê agirî
Kew ji tirsê nema dixwînin
Roj ji dumanê silav neda
Di dengê mirinê de
Zarok giriya, tirs û birs hinagiv-tin
Nalînê kolan ji bêdengiya
Qîz û xortan veristin
Erd ji barê kelaxan giriya
Westiya
Qeriya
Rubarên xwînê herrikîn
Dengê me, sinorê xwedê derbas kir

Hitimbûna xwe li bejna min aland
Reşkirasên min ji xwînê neqişî
Ahenga te, keleha Hewlêrê ve-got
Bedena Amedê hejand
Çarçira ya Mihabadê hilda
Min jî sirûdên te
Lorandin
Firmêskên xwînê
Qamişloka serhildan
Bi hawara evînê nixamt
Gaziyên min
Xweziyên min
Li biyanistanê, ji deryayê û wir de
Gulên xwe bi xwîna şehîdan ni-mandin
Sefera darbestê gotin
Xêzên min